

Kurdiska (Kurmanji) – Bra att känna till inför ett besök hos oss

## Bixêrbên Lênêrîna diranan ya gelî li Västra Götaland

### Baş e ku ev agahdarî bèn zanîn berî serlêdana we ya li ba me

Serlêdana lêngêrîna diranan ya gelî li temamê Swêd heye û her wiha heman sazî li 49 şaredarîyên Västra Götalandê jî heye.

Li Västra Götalandê lêngêrîna te ya diranan beleş e heya temenê te bibe 23 sal. Weke dê û bav hun dikarin bi 2 şêweyan xercê lêngêrîna diranan bidin; piştî her cara lêngêrînê an jî bi rîya hejmarek pereyên neguher ku wê her meh bèn dayîn. Bi klînîka ku li diranên te dinêre re bi axîfe jî bo ku derbarî xerc û lêçûna lêngêrîna diranan de te agahdar bikin. Ger tu naçî çî klînîkan tu dikarî jî bo heman mijarê bi sazîya lêngêrîna diranan ya gelî re jî bi axîfi.

### Lêngêrîna diranan ya lezgîn

Dema pirsgirêkên te yên demildest jî bo diranan hebin ya herî rewa ewe ku tu berê xwe bidî klînîka ku tu herdem diçî jî bo lêngêrîna diranên te. Ger te çî pêwendî bi hîn klînîkan re nebe berê xwe bide sazîya diranan ya gelî ku herî nêzî te ye. Ger klînîka ku te berê xwe dayî girtî be hîngê tu dikarî jî beşa demildestî ya sazîya lêngêrîna diranan ya gelî li herêma tu lê dijî alîkarî wergirî. Her wiha tu dikarî jî xeta agahdarî wergirtine ya tenduristî re telefon bikî û agahdarî bistînî.ji hejmarê 1177.

### Werger

Ger te pêwîstî bi werger hebe bi klînîka xwe re pêwendî deyne. Xizmeta wergerîyê jî bona we bê xerc e, ango beleş e.

### Bi bîranîna bi rîya SMS ê

Ger telefonê te li ba sazîya lêngêrîna diranan qeydkirî be wê hîngê jî te re roj berî serlêdana te bibîranînk bi rîya SMS jî te re bê şandin. Ger jî ber hîn sedeman jî te re SMS nehatî be jî û ew dema te veqetandî bettal nabe, tu pêwîste di dema xwe de herî cîhê serlêdanê.

### Veguhêrandina demê

Dema tu nikarî bê dema jî te re hatî veqetandin tu yê bi rîya koda xwe ku li ser kaxeza dem lê nivîsî heye, bikanî dema xwe biguhêrînî an jî ji nuh ve veqetînî li ser malpera me [www.folktandvarden.se/vgregion](http://www.folktandvarden.se/vgregion). Di malperê de serî li beşa "dema xwe ji nuh ve veqetîne" bide. Her wiha jî bona heman armancê dikanî pêwendî bi klînîka xwe re deynî û bi rîya telefon an jî nemeya elektronîk. Agahîyên di derbarî pêwendî e li ser malpera [www.vgregion.se/folktandvarden/hittamottagning](http://www.vgregion.se/folktandvarden/hittamottagning) hene.

## **Ji bo betalkirina demê timî caran pêwendî bi klînîka xwe re deyne.**

Dema tu wexta ji te re veqetandî betal bikî baştîre ku bi lezgînî klînîka xwe agahdar bikî da ku ew dem ji kesên din re bê dayîn. Lewma roja berî dema veqetandî herî dereng seet 12 yan bi rîya telefon yan jî bi rîya nameya elektronîk agahdar bike û dema xwe betal bike. Ger tu nexwaş bikevî heman roja ku tu ger bihata klînîkê, pêwendî deyne bi klînîka xwe re herî dereng yek seet piştî klînîk hate vekirin.

## **Dema veqetandî ya bi kar nehatî (ji bo zarok û salmezinan)**

Ger tu dereng werî dema veqetandî an jî qet neyî tu yê hîngê heqqê wê serlêdanê bi temamî bidî. Wexta ku tu dema ji te re veqetandî dereng betal bikî jî heman şerd derbas dibe.

## **Bîryar bide ka tu çawa dixwazî xercê serlêdana xwe bidî**

Tu dikanî xercê lînêrîna diranên xwe an pêşîn bidî an jî bi karta xwe. Li hîn klînîkan tenê kart tê qebûl kirin ango pereyên bi dest tî dayîn wernagrin. Ji klînîka xwe pirsîyar bike ka kîjan şerd û merc derbasdibin di vî warî de.

## **Ger tu ne razî bî**

Em wek sazîya gelî ya lînêrîna diranan qîmeteke mezin didinê ku kesên li ba me diranên xwe çêdikin memnûn bimînin ji lînêrîn û pêşwazî kirina wan ya ji hêla bijîjk û hemşîrên me de. Ger tu ji ber hîn sedeman menûn nemînê em dixwazin tu bi me re pêwendî deynî da em bikanin xizmetê xwe baştir bikin.

Weke gava yekem berê xwe bide kesê li te nêrî û bîne ziman ka şaşî çîye û çima çebû. Ji wê bi şunde tu dikarî bi berpîrsê klînîkê re pêwendî deynî.

Bi rîya nameya elektronîk jî tu dikarî dîtînen xwe bişînî ji me re. Navnîşana nameyên elektronîk ya me eve: [synpunkter.folktandvarden@vgregion.se](mailto:synpunkter.folktandvarden@vgregion.se)

## **Pirs**

Tu dikarî herdem berê xwe bidî me ger çî pirs û pîrsgirêk hebin. Lewma pêşî berê xwe bide klînîka ku tu ji bo lînêrînê pê ve girêdayî ye.